

Bokan

Bokan , şarêkî mezin u xoşdîmen u r'azawey Kurdistane.
Le nawendî şarî Bokan da , çomêkî gewre têper' debêt.
Kêwî (NAĽEŞiKÊNE) le nêwer'astî şarî Bokan daye.
Şax u kêwekanî şarî Bokan wekû bûkan cwan u nexşînin.
Xel'kî şarî Bokan r'ûh' sûk u r'ûgeş u mîhrebanin.

Waney 39

Tavge Solav

Solav amozay Tavgeye . Solav çwar sal'aneye u Tavge pê denête pêncemîn sal'î temen .

Solav u Tavge temenyan keme u bo fêrge nabin. Ewan pêkewe deçine polî sawayan u le polî sawayan da gwê le honrawe u goranî u çîrok r'adegirin.

Mamosta Viyan , mamostay Solav u Tavgeye . Ewan mamostay xoyan xoş dewê .

Tavge le mal' da taqaneye u hîç xuşk u birayekî niye. Bel'am Solav birayekî heye . Birakey Solav şeş manganeye.

Birakey Solav Avanî nawe. Avan şîrexoreye . Avan heta birsî debê, her degirî.

Daykî Solav car car Avan bo Solav u Tavge cê dehêl'êt u be şwên karî xoyda deçête der.

Solav u Tavge xerîkî Avan debin u nahêl'in bigirî .

Avan car care gal' u giɛ' deka. Kiçekan be gal u giɛ' kirdinî Avan têr têr pêdekenin.

Tavge u Solav ɛaşiqî gul' u gul'zarin. Ewan hemû r'ojêk , pêkewe deçine nêw gul'zar u , her yek çepkêke gul'êkî cwan deçinêt.

Tavge çepke gul'î xoy bo daykî debatewe, bel'am Solav çepke gul'î xoy bo Avan debatewe u le tenîşt lankekey da daydenêt. Solav be Avan del'ê : - Biv Avan !... Kure nekey gul'ekanim lê bixoyit .

Tavge u Solav bûk bûkên deken.
Ewan kiras u kewa u derpê bo bûkekaniyan dedûrin u deberyan deken.



Řojêk , Solav u Tavge xerîkî cilik dirûn bûn. Le pir' Tavge gutî :

- Solav ! To le pencerey mal'î dirawsêketan bir'wane !

Solav seyrêkî kird u gutî :

- ey ey !... Lem dû kur'e ser fîlane bir'wane! … Bir'wane çilon le pştî pencerewe seyrî ême deken !

Solav u Tavge pêkewe hestan u le ber pencere r'awestan.
Solav bangî kur'ekanî kird u gutî :
- Kur'îne ewe bo le piştî pencerewe seyrman deken ?!
Kur'ekan tirsan u le jêr pencere da xoyan şardewe .
Kiçekan têr têr pêkenîn .

Waney 40

Hel'per'kê

Kiçekan werin !...
Werin.. dîlan u şayî u hel'perkêmane !
Hel'al'e were !... Gul'al'e were ! … Ferentî were ! … Soybe were ! …
Henar were ! … Gezîze were ! … Beyan were ! … Şîlan were ! …
Sêwê were ! … Şemê were ! …
Kiçîne werin ! … Werne dawetê !
Şayî u dilan u hel'perkêy ême bebê êwe sard u sir'e !
Werin gewre kiçekan !...
Werin dunyakey ême bebê êwe çol u sard u qaqir'e.

Waney 41

Gul'al'e Hel'al'e

Hel'al'e u Gul'al'e dû destexuşkî xoşewîstî yektirn . Ewan eger r'ojêk yektir nebînin , aram nagirin .
Hel'al'e u Gul'al'e hawtemen u hawders u drawsêy yekin . Hel'al'e kiçe Sineyîe u Gul'al'e kiçe Mehabadî , bel'am êsta le wl'atî Swîd dejîn u le şarî Stokhol'im deris dexwênin.
Îmsal' , sal'î axirî xwêndinî cûtey awal'ane u xoyan bo zanko amade deken.
Hel'al'e be niyaze le beşî çaw da deris bixwênêt u bibête doktorî çawan. Gul'al'e h'ez be kompîoter dekat u deyewê be şwên ew beşe da biçêt.